## PÊŞEKÎ

"Diwazde Wane" le nêwan 1969-1971 da, le Hewlêr û gundî Kendall nûsrawe.

Yekem car rrojî 22/3/1972 le Kerkûk, le yekem festîvallî şî'rî kurdî, le hollî qutabxaney nawendîy Îmam Qasim xwêndrawetewe.

Çarenûsim, çi wek şa'îr çi wek mirov, çi be lay başe da çi be lay derd û bellay dinya da, ta rradeyekî zor derencam û darriştey em şî're ye. Demewê billêm: eger em şî'rem nenûsîba, ke nûsîşim carrim nedaba û rrûberûy sîstemî bîrkirdnewey ewan rrojan nebamayewe çarenûsêkî dîm debû.

**Abdulla Peşêw**

**Helsînkî – 2/10/2002**

# PÊŞGOTIN

"Diwazdeh Wane" di navbera 1969-1971ê de, li Hewlêr û gundê Kendalê hatiye nivîsîn.

Cara pêşî roja 22/3/1972yan li Kerkûkê di yekem festîvala helbesta kurdî de, di hola xwendingeha Îmam Qasim de hatiye xwendin.

Çarenûsa min çi wek helbestvan çi wek mirov, çi ji aliyê başiyê, çi ji aliyê derd û belayên dinyayê ve heta radeyeke zêde derencam û deravêteya vê helbestê ye. Min divê bibêjim eger min ev helbest nenisiviya, ku min nivîsî jî min nexwenda û ez rûbirûyê sîstema hizirîna wan rojan nebûma dê çarenûseke min a din hebûya.

**Abdulla Peşêw**

**Helsînkî – 2/10/2002**

**WANEY YEKEM**

Minallekan,
Ey yaxîye jîntallekan:
Sibey êwe ke gewre bûn,
Le lawika,
Le heyrana,
Le mizgewt û dîwexana,

## WANEYA YEKEM

Zarokno,
Ey asiyên jiyantehlno:
Sibê ku hûn mezin bibin,
Ji lawikan,
Ji heyranan,
Ji mizgeft û dîwanxanan,

Le çîroka,
Le honrawey şa‘îrêkî tirsnoka,
Rrenge zortan ber gwê kewê
Basî ême û azayetî,
Basî ême û kurdayetî,
Bellam neken birrwa biken,
Hemûy diron, diroy petî!

Ji çîrokan,
Ji helbestên şa'îrekî tirsonek,
Dibe gelek bê guhên we
Behsa me û azayiyê,
Behsa me û kurdîtiyê,
Lê nebî hûn bawer bikin,
Tev derew in, derewên rût!

## WANEY DUWEM

Minallekan,
Ême tûşî sed kwêrerrêyn...
Çiray bîrman gelêk kiz e,
Hengawî kwêrane denêyn!

## WANEYA DUYEM

Zarokno,
Em duçarî sed korerê ne...
Çiraya hizra me pir zenûn e,
Em gavên korane davêjin!

Minallekan*,
Efsanekan degêrrnewe:
Hebû... nebû...
Hozêk hebû le xakêka.
Pallewanyan –
Çawî kwêr bû,
Heway dewrey xoy depêka.
Feylesûfyan –
Fallçîyek bû,
Şewan fallî degirtewe,
Ta bizanê key dujmin boy
Pet dexate gerdinî xoy.

---

* Em birrgeye le çapekanî pêş 2006 da nîye û le bîr kirabû. Payîzî 1980, le Viyenna, hawrrêm D. Kurdo Elî tewawî deqekey webîrhênamewe.

Zarokno*,
Efsaneyan vedibêjin:
Hebû... nebû...
Hozek** hebû li warekî.
Pehlewanê wan –
Kor bû,
Hewaya dora xwe dihingaft.
Feylesofê wan –
Falavêj bû,
Bi şev li falan dinêrî
Da bizane kengê dijmin ji bona wî
Kindir dixe hustiyê xwe.

---

* Ev birgeh di çapên berî 2006an de nîne û hatibû jibîrkirin. Di payîza 1980yî de, li Viyanayê, hevrêyê min
D. Kurdo Elî temamê deqê anî bîra min.

** Hoz: êl, eşîret

Piyawmaqûlyan –
Kerr û lall bû,
Mawey kurtî aramîşî hezar sall bû!
Hozî negbet
Şewî dejmard,
Rrojî dejmard,
Sê jem nan û çeplley dexward,
Çawerrê bû ke dujmin boy
Pet bixate gerdinî xoy!

Maqûlê wan –
Ker û lal bû,
Dema kurt a aram a wî hezar sal bû!
Hoza reben
Şev dijmartin,
Roj dijmartin,
Sê dan nan û çepik dixwarin,
Li bendê bû ku dijmin bo wî
Kindir bixe hustiyê xwe!

## WANEY SÊYEM

Minallekan,
Êwen zelkaw deşlleqênin,
Êwen ew bûmelerzaney
Sibey kanî deteqênin;
Êwen sibey
Sinûrî destkird deşkênin,
Qefî zincîrî lêkpiçrraw
Be yektirewe delkênin.

## WANEYA SÊYEM

Zarokno,
Hûn in litavê dê bihejînin
Hûn in ew erdheja
Sibê kaniyê dê biteqînin;
Hûn in sibê
Sînorê çêkirî dê bişkînin,
Xelekên zincîra jihevqetî
Bi hevdu ve bizelqînin.

Êwen sibey
Le Qamîşlî,
Le Diyarbekirî Şêx Se‘îda,
Le Silêmanîy birîndara,
Le Mehabadî Qazî da,
Be yek felsefe pêdegen,
Gişt têdegen:
Ewey kurd bê, newey niwê bê,
Debê têşûy
Rêy yekyetî kurdî pê bê!

Hûn in sibê
Li Qamîşlo,
Li Diyarberkira Şêx Seîd,
Li Silêmaniya birîndar,
Li Mehabada Qazî,
Bi felsefeyekê pêbigîjin,
Gişt têbigîjin:
Yê ku kurd be, nifşê nû be,
Divê tûşeya*
Riya yekîtiya kurdan pê re be!

* Tûşe yan toşe di wateya xurek û zewade de ye.

## WANEY ÇWAREM

Minallekan,
Le wanekanî dwênêm da
Gutim ême lewetî heyn,
Diro legell xoman dekeyn,
Le jînmana,
Le kirdewe û nûsînmana
Bê felsefeyn.

## WANEYA ÇAREM

Zarokno,
Di waneyên min ên duh de
Min got ji dema ku em hene,
Em derewan li xwe dikin,
Di jiyana xwe de,
Di kirdar û nivîsînên xwe de
Bê felsefe ne.

Emem gut û dinya rrima
Hewrî tane
Berew asoy bîrim cima!

Minallekan,
Tuxwa key bipirsin lêyan,
Bipirsin le waney çawyan
Tînî nagate ber pêyan,
Metirsin, bipirsin, billên:
Le seferî durrgey xwêna
Bo minallan çîtan hêna?
Pêman billên, çîtan hêna?!

Min ev got û dinya rûxiya
Ewrê tehnê
Ber bi asoya hizra'm liviya

Zarokno,
Ji bo Xwedê bipirsin ji wan
Bipirsin ji wan, ên ku têhna çavên wan
Nagihîje ber piyên wan,
Metirsin, bipirsin, bêjin:
Ji sefera girava xwînê
Bo zarokan we çi anî?
Bibêjin me, we çi anî?!

## WANEY PÊNCEM

Minallekan,
Ey bêlane jîntallekan:
Zor le mêje daykekanî em willate
Memkekanyan
Şîrî serbestî tiya qat e.
Zor le mêje kêwekanî em willate
Pêxemberêkyan tiya qat e!

## WANEYA PÊNCEM

Zarokno,
Bêhêlînên jiyantehlno:
Pir ji mêj ve di memikên
Dayîkên vî welatî de
Şîrê serbestiyê nemaye.
Pir ji mêj ve li çiyayên vî welatî
Pêxemberekî wan nemaye!

Minallekan,
Le agirdanî çawtan da
Min çawerrêy Zerdeştêk im,
Bê, cê bew bitane leq ka.
Min çawerrêy
Çexmaxey Avêstayek im,
Bê, cergî tarîkî şeq ka!

Zarokno,
Di agirdana çavên we de
Ez li benda Zerdeştek im,
Da ku bê û cihê wan pûtan bileqîne.
Ez li benda
Çirûska Avestayek im,
Da ku bê û cergê tarîtiyê biqelşîne!

## WANEY ŞEŞEM

Minallekan,
Senger senger çiyakan gerram,
Gwêm lê bû, komelêk qewan*,
Le naw sengerêkî çoll da,
Le pêşmergey şehîd dediwan!

---

* Qewan: Qawxî fîşek, qepêlkî betalî gulle.

## WANEYA ŞEŞEM

Zarokno,
Çeper çeper li çiyan geriyam,
Min bihîst, hinek qewan*,
Di nav çepereke vala de,
Qala pêşmergê şehîd dikirin!

---

* Qewan: Qaşilê fişekê, pelikê vala yê guleyê.

## WANEY HEFTEM

Minallekan,
Desgîranim kotirêkî Diyarbekir e.
Hezî le çiya û qaspey kew û rrengî befr e.
Bo gwastnewey
Zincîrey çiyam qef qef birrî.
Rrojjimêrim perr perr dirrî.

## WANEYA HEFTEM

Zarokno,
Desgirtiya min kevokeke Diyarbekirê ye.
Evîndara çiya û qaqiboya kewê û rengê berfê ye
Bo veguhestina wê
Min zincîreya çiyan xelek xelek birî.
Min salname per per dirî.

Pesaportim?!
Awat û zerdexene bû,
Kildan û kîsêk xene bû.
Ke le dergey sinûrim da,
Lebatî maç,
Maçî germî desgîranim,
Tifî zerdî postallrreşêk
Hat siwaxî da nawçewanim!

Pasaporta min?!
Hêvî û bişirîn bû,
Kildan û kîsek hine bû.
Ku min li deriyê sînor da,
Di şûna maçê,
Maça germ a destgirtiya min,
Tifa zer a postalreşek*
Hat sîwax da nav çavên min!

* Mebest ji postalreş cendirme ne ku pêlavên reş li xwe dikin.

## WANEY HEŞTEM

Minallekan,
Ey birsîye jîntallekan:
Le ser singe newtawîyekey Babegurrgurr,
Nêzîk tavgey serewjûrî zêrrînî girr,
Gillgoyekî biçkolem dî.
Lêy nûsrabû:
"A lêre da minallêkî çawgeşî kurd
Le birsan mird!"

## WANEYA HEŞTEM

Zarokno,
Ey birçiyên jiyantehlno:
Li ser singa neftavî ya Babegurgur,*
Nêzîkî sûlava berbijor a zêrîn a girr**,
Min goreke biçûcik dî.
Li ser hatibû nivîsîn:
“Aha li vir zarokekî çavgeş ê kurd
Ji birçîna mir”

* Babegurgur: Devera petrolê li Kerkûkê
** Girr: pêt, rivîn

## WANEY NOYEM

Minallekan,
Ewey denkegenimêkî çand –
Gullegenmî dirwêne kird.
Ewey dillopêk xwênî çand –
Tabloyekî bo xoy nexşand.
Ewey tenya hawarêkî le dem derçû –
Gwêy le seday dengî xoy bû.

## WANEYA NEHEM

Zarokno,
Yê dendika genimekî çand
Gulgenimek dirût.
Yê dilopek xwîn çand –
Tabloyek ji bo xwe nexşand.
Yê tenê hawarek ji dev derket –
Guhê wî li olana dengê xwe bû.

Keçî ême
Kaseser û çaw deçênîn,
Baranî xwên be seryana debarênîn,
Hêşta werzî dirwêneşman diyar nîye.
Ta gullegenmêkî kêlgey
          Ew xwêneşman diyar nîye.

Minallekan,
Ba ew cogeye bigorrîn
Ke xwênmanî pê da derrwat.
Ba ew zemîneş bigorrîn
Ke çaw û kaseser dexwat.
Ewca kêlgey rrûnakîtan nîşan dedem.
Ewca werzî dirwênetan bo rrist dekem.

Tevî ku em
Kilox û çav diçînin
Barana xwînê bi ser wan de dibarînin,
Hêja werza dirûna me jî ne diyar e.
Heta gulegenimeke zeviyê
                Xwîna me jî ne diyar e.

Zarokno,
Em wê coyê biguherînin
Ku xwîna me tê re diçe.
Em wê zemînê jî biguherînin
Ku çav û kiloxan dixwe.
Hingê zeviya ronahiyê nîşanî we didim.
Hingê werza dirûnê ji bo we lixab* dikim.

* Lixab: gem

## WANEY DEYEM

Minallekan,
Le ser nawçewanî zerdî rrojnamekan,
Le ser borrîye newtekan,
Le dîwarî awdestxaney mizgewtekan,
De millyon car
Nûsîman: "bijî çewsawe"

Bellam hemû nûsînekan,
Tenya carê,
Neyantiwanî bibne parû,
Têr ken zigî kirêkarê!

## WANEYA DEYEM

Zarokno,
Li ser eniya zer a rojnameyan,
Li ser boriyên petrolê,
Li dîwarên avdestxaneyên mizgeftan,
Deh milyon car
Me nivîsî: "Bijî bindest,"
Me nivîsî: "Bijî karker!"

Lê belê hemû nivîs,
Tenê carekê
Nekarîn bibine pariyek
Têr kin zikê karkerekî!

**WANEY YAZDEM**

Minallekan,
Ey bêlane jîntallekan,
Şew le xewma rrêbwarêk bûm.
Bo baregay "Yutan"* deçûm.
Ke derwazekey qûtî dam
Rreşim bînî –allay hebû,

* Yutan (1974-1909): Sikirtêrî giştî neteweyekgirtuwekan le nêwan sallanî 1961-1971 da.

## WANEYA YAZDEHEM

Zarokno,
Bêhêlînên jiyantehlno,
Bişev di xewa xwe de rêwiyek bûm.
Bo baregeha "U Thant"* diçûm.
Ku deriyê wî ez daqurtandim
Min reşik dît –ala wî hebû,

* U Thant (1974-1909): Sekreterê giştî yê Neteweyên Yekgirtî di navbera salên 1961-1971ê de.

Spîm bînî –allay hebû,
Herçîm bînî –allay hebû.
Qîjandiyan:
Ey bê willat, bo derewe!
Ey bê alla, bo derewe!
Minîş gutim:
Meqîjênin!
Ke deçmewe,
Em çîroke bo minallan degêrrmewe!

Min spî dît –ala wî hebû,
Min çi kes dît –ala wî hebû.
Qîrîyan:
Ey bêwelat, derkev derve!
Ey bêala, derkev derve!
Min jî got:
Meqîrin!
Ku ez vegerim,
Vê çîrokê ji zarokan re vedigêrim!

## WANEY DIWAZDEM

Minallekan,
Ke wanekan dexwêninewe,
Eger rroj bû,
Le kuncêka kip helltûtên.
Eger şew bû,
Ba çirakan kiz bisûtên.

## WANEYA DIWAZDEHEM

Zarokno,
Ku hûn waneyan dixwînin,
Eger roj bû,
Di kuncek de tot bibin.
Eger şev bû,
Bila çira zenûn bibin.

Çak dezanim,
Gewrekantan bitanbînin,
Daxtan deken,
Wanekanim desûtênin;
Dên, dubare,
Cestey Hellac dedenewe le sêdare!

Baş dizanim,
Mezinên we, we bibînin,
We dax dikin,
Waneyên min dişewtînin;
Tên dubare,
Bedena Hellac bi dar ve dikin!

# ÇEND ŞÎ'RÊKÎ QEDEXE

## NEWROZÎ 1969*

Pirsîm le Kawey bapîrim,
Gutim: Babe! Wa destbest em,
De pêm billê, çon degeme
Newrozekey sedey bîstem?
Gutî: Rrolle! ger Kurdistan
Biken be parçe agirê,
Nek Zuhakêk, hezar Zuhak
Mil keç deka û xoy nagirê!

*1969-Kurdistan*

* Yekem car le Newrozî 1969 da, le Mexmûr, xwêndarawetewe.

# ÇEND ŞΑRÊN QEDEXE

## NEWROZA 1969an*

Min pirsî ji Kaweyê bapîrê xwe
Min got: Babo! dest bestî me
De bêje min, çawa digîjim
Newroza sedsala bîstem
Gote: berxê'm! ger Kurdistanê
Bikin parçeyeke agir,
Ne Dehakek, hezar Dehak
Xwe diçemîne û berxwenade!

*1969-Kurdistan*

* Cara pêşî di Newroza 1969an de li Mexmûrê, hatiye xwendin.

## BO ŞOVÎNÎM?

Wa Vêtnamî
Bo Vêtnamiyan ser dadenên,
Felestînî demirin, dejîn,
Bo her dillopeawêkî,
Bo her berdêkî Felestîn.

Eger minîş dawa bikem
Serbest bijîm, wekû piyaw,
Le Kurdistanêkî azad,
Nek letlet û pêşêlkiraw,
Bo şovînî û xoperist im?
De pêm billê, xoşewîstim?
Bo şovînî û xoperist im?

*1970-Kurdistan*

## ÇIMA ŞOVEN IM?

Waye viyetnamî
Bo viyetnamiyan ser datînin,
Filîstînî dimirin, dijîn
Bo her dilopeke avê
Bo her kevrekî Filîstînê.

Eger ez jî dawa bikim
Serbest bijîm, mîna mêran,
Li Kurdistaneke azad,
Ne par par û binpêkirî
Çima şoven û xweperest im?
De bêje min, ezîzê min
Çima şoven û xweperest im?

*1970-Kurdistan*

## ALA*

Dostekanim, baş bizanin!
Dujminanim, baş bizanin:
Çend bawerrim be Zerdeşt û
Be Avêsta û be Xwa heye,
Hezar hêndeş
Bawerrim be hellkirdinî alla heye!

*1970-Kurdistan*

---

* Yekem car rojî 24/6/1971 le şarî Koyê, le Vêstîvalî Hacî Qadir da xwêndrayewe.

## ALA*

Dostên min, baş bizanin!
Dijminên min, baş bizanin:
Çend baweriya'm bi Zerdeşt û
Bi Avesta û bi Xwedê heye,
Hezar qat jî
Baweriya'm bi hildana alayê heye!

*1970-Kurdistan*

* Cara pêşî di 24/6/1971ê de li bajarê Koyeyê, di Festîvala Hacî Qadir de hatiye xwendin.

**EPOLLO***

Ey mang, gerrîdey bê willat
Sûçî xot bû Epollo hat!

Minî kurdîş, rrojanî zûm,
Wek to le popey berzî bûm,

Keçî pakî û rrûnakîy xom
Bûn be mayey negbetî bom:

Parûm, newtim, deştim, girdim,
Hemûyan lê dagîr kirdim!

*1970-Hewlêr*

* Epollo yekem mirov e le ser rrûy mang dabezand. Em şî‘re yekem car êwarey rojî 24/6/1971 le şarî Koye, le Fîstîvalî Hacî Qadirî Koyî da, xwêndrawetewe.

## APOLLO*

Ey heyv, geroka bê welat,
Sucê te bû Apollo hat!

Ezê kurd jî, rojên di zû,
Wek te li kopê bilindiyê bûm,

Lê pakî û roniya min
Bûn sedema belayê bo min:

Pariya'm, newta'm, deşta'm, girê min,
Hemûyan ji min dagîr kirin!

*1970-Hewlêr*

* Apollo yekem mirov e ku çûye heyvê. Ev şî'r yekem car êvara roja 24/6/1971 li bajarê Koyeyê, di Festîvala Hacî Qadirî Koyî de, hatiye xwendin.

## SERKEWTIN

Ser dekewîn!
Çunke dwênê
Topequrrêkî destkirdim
Daye dest minallêkî kurd,
Ew, lebatî bûkeşûşe,
Tifengêkî biçkolaney lê dirust kird!

*1971-Kurdistan*

## SERKEFTIN

Em bi ser dikevin
Lewra duhî
Min goka heriyekê çêkirî
Da destê zarokekî kurd,
Wî di şûna lîstokekê,
Tifengeke biçûcik jê çê kir!

*1971-Kurdistan*

## AŞTÎ

Xwa dezanê
Ballay tifengim xoş nawê!
Bellam, ax! Kotrekey aştî
Kirr e wekû şêrebefrîney beyanî,
Le ser lûley topî matî Westa Rreceb*
Denûkî xoy
Xistote jêr ballekanî.

Wek bîstûme,
Ew kotre mangirtuwe,
Le asmanî willatêkî bêalla da
Be şirîxey tifeng nebê,
Qet le şeqey ballî nada!

*23/5/1973-Kurdistan*

* Westa Rreceb: Çeksazêkî behredarî kurd bû, gelêk topî bo leşkerî Paşay Gewrey Rriwandiz dirust kird, ke hendêkyan ta êstaş her mawin.

## AŞTÎ

Xweda dizane
Ez ji bejna tifingê hez nakim!
Lêbelê, ax! Kevoka aştiyê
Kerr e mîna bûka berfê ya sibehê,
Li ser lûleya topa mat a Westa Receb*
Nikila xwe
Xistiye bin baskên xwe de.

Bi bihîstina min,
Ew kevoka mangirtî**,
Di asmanê welatekî bêala de
Bi şîrqîna tifingê nebe,
Qet baskên xwe naleqîne!

*23/5/1973-Kurdistan*

---

* Westa Receb: Çeksazekî behremend ê kurd bû, gelek topan ji bo leşkerên Paşayê Mezin ê Riwandizê çê kirine, ku hinekên wan heta niha jî her mane.

** Mangirtî: kesê ku di grevê de ye.

## TE‘RÎB*

Le asmanewe nehatûm,
Min mêwan nîm.
Min mêwanî sêberqursî Kurdistan nîm.
Ber le mêjû
Kanîyek bûm, lêre derbûm.
Ber le mêjû
Agirêk bûm, lêre hellbûm.

* Te‘rîb: Yekem car le 16/8/1973 da, le yaney mamostayanî şarî Kerkûk da, xwêndrayewe. Rrûy em şî’re lew dagîrkerane ye ke bo ‘erebandin nardirabûne Kurdistan, nek ‘ereb be giştî, ke dirawsêy le mêjîney gelî Kurdistan in.

**EREBKIRIN***

Ji asman ve nehatime,
Ne mêvan im,
Ne mêvanê sîtariya Kurdistanê me.
Berî dîrokê
Kaniyek bûm, li vir derbûm.
Berî dîrokê
Agirek bûm, li vir hilbûm.

* Erebkirin: Cara pêşî di 16/8/1973yan de di mala mamosteyan a Kerkûkê de hatiye xwendin. Berê vê helbestê li wan dagirkeran e ku bi mebesta erebkirinê ji boKurdistanê hatine şandin, ne ku ji bo hemû ereban e, ku cîranê mêjîn ên gelê Kurdistanê ne.

Bar ken, birron!
Kanyawekan, cige le min,
Kesêkî dî têraw naken.
Dargwêzekan, cige le min,
Bo hîç kesêk
Sêberî xoyan hellnaxen!

Bar ken, birron!
Zewîême
Danî êwey lê şîn nabê.
Mêrgekanman
Le jêr pêy garranekantan wek agir in...
Ta dartûşman yaxî debin,
Colaneyek bo minalltan rranagirin!

Bar kin, herin!
Kaniyên me, ji bilî min,
Kesekî din têrav nakin.
Dargûzên me, ji bilî min,
Bo tu kesek
Sîbera xwe danaxînin!

Bar kin, herin!
Li zeviyên me
Tovên we şîn nabin.
Mêrgên me
Di bin piyê garanên we wek agir in...
Heta dartûyên me jî asî dibin,
Hêlekanekê bo zarokên we ranagirin!

Bar ken, birron!
Bar ken birron!
Mêwey dirextekanman kall e,
Awman swêr e,
Hengiwînman be demtan tall e!
Bar ken, birron!
Bar ken, birron!

*1973-Kurdistan*

Bar kin, herin!
Bar kin, herin!
Fêkiyên darên me negihayî ne,
Ava me şor e,
Hingivê me di devê we de tehl e!
Bar kin, herin!
Bar kin, herin!

*1973-Kurdistan*

## TIKAYEK

Zor tika ye...
Bo ewey minallî êmeş
Bûkeşûşeyan dest kewê
Wekû hemû minallanî em dinyaye:
Fêryan biken, rrayanbênin
Tank û topî dagîrkeran têk bişkênin!

*1973-Mosko*

## TIKAYEK

Pir tika ye...
Ji bo ku zarokên me jî
Lîstok bi destê wan kevin
Mîna hemû zarokên vê dinyayê:
Wan hîn bikin, wan telîm kin
Tank û topên dagirkeran têkbişkînin!

*1973-Mosko*

**BORDUMAN**

Dwa estêre
Nuqurçêkî
Le kelekey gundekem da.
Xor wek cûçke
Hêlkey asoy tirûkand û
Geskî tûkî xoy le tem da.

## BOMBARDÛMAN

Stêrka dawî
Nuqurçekî
Li tengala gundê min da.
Roj wek çûçik
Hêka asoyê veqelaşt û
Gezika pûrtê xwe li mijê da.

Lew kate da poste geyşt...
Postey rreşî Bexda geyşt.
Namey girr û saçmey hêna
Bo ew gundey xunçekanî
Hellnestabûn le naw niwêna...
Lew dîw hewran
Tozêk xilltey wîjdan mabû,
Ta ewşî le bin pê na!

Êstaş degêrrnewe û dellên:
Bêşkeyekî lasûtawî... tenya cêmaw
Be kull daye pirrmey giryan
Bo kanîyek girrûgallî
Tahetayê xefekiraw.

Di wê gavê poste gihîşt...
Posta reş a Bexdayê gihîşt.
Nama pêt û saçmeyê anî
Bo wî gundê xunçeyên wî
Ranebûbûn ji nav nivîna...
Li jor ewran
Piçek tilpa wîjdanê mabû
Heta ew jî da bin piyan!

Niha jî qal dikin û dibêjin:
Landikeke nîvşewitî ya tenêmayî
Bi kel kir nîşqîn û giriya
Bo kaniyek gixûbixa wê
Hetahetayê vemirandî


Êstaş degêrrnewe û dellên:
Lew kate da
Zewî girya,
Asman girya,
Încîl girya,
Quran girya,
Girya... girya...
Hemû şitêk, bê deng girya...
Tenya le naw minalldanî afretêka
Giyanêkî nwê çawî pişkût,
Nîgay gêrra... le pirrêka...
Le naw mişkîy dway dozexa
Tirûskayî rabûnêkî tazey pêka.

*1972-1973-Kurdistan*


Niha jî qal dikin û dibêjin:
Di wê gavê
Erd giriya,
Asman giriya,
Încîl giriya,
Quran giriya,
Giriya... giriya...
Her tiştekî, bê deng giriya...
Tenê di nav malzaroka jinekê da
Giyanekî nû çavê xwe pişkaft
Çavê xwe gerand... ji nişkê ve...
Di nav xweliya dawiya dojehê de
Çirisîna rabûneke teze hingaft.

*1972-1973-Kurdistan*

# Albûm




Erîwan, 04. 02. 1977



Mosko, 27. 11. 1978



Mosko, 27. 11. 1978




Hewlêr, 1992




Hewlêr, 1992; piştî 20 salan vegera Kurdistanê



Hewlêr, 1992; Kora Helbestê




Mosko, 1998




Kurdistan, 2005






Kurdistan, 2005



Hewlêr, 2012, Êvara Helbestê




Hewlêr, 2012






Hewlêr, 2012



Bajarokê Koyeyê, 2012



Bajarokê Koyeyê, 2012




Bajarokê Koyeyê, 2012




Silêmanî, 2012



Silêmanî, 2012



Silêmanî, 2012



Portreya Peşêw;
*Hunermendê Ereb Yehya Alsheix*

